Qamişlo taxa Xerbî/426184

Serêkaniyê/ Kolana Tecnîdê/817697

Girkê Legê Kolana Şaredariyê / 744889

إذا كنتِ بدك مكان آمن تحكي فيه ... ؟

اتصلي فينا على الأرقام التالية:

٠٩٨١٦٤٥٨٧٩ - ٠٩٣٢٣٨٤٠٩٧ - ٠٩٨١٤٥٥٦٢٥

أو تفضلي بزيارتنا في مستوصفات الهلال الأحمر الكردي:

القامشلي / جانب كازية السياحي / ٤٢٧٠٨١ / أو بيت المرأة

رأس العين / شارع الكنائس / ٨١٤٤٥٥ / القامشلي / الحي الغربي / ٤٢٦١٨٤

المعبدة / شارع البلدية / ٧٩١٤٦٥٠٧ / رأس العين / شارع التجنيد / ٨١٧٦٩٧

٧٤٤٨٨٩ / شارع البلدية / ٧٤٤٨٨٩

Cihekî xwe di nava Xeleka Jin û Keçan de
bigre û hevalên taybet bi xwe çê bike



0981455625

0981645879

0932384097

مزعوجة وحابه تفضضي في مجموعة نسائية؟
تعي انضمامنا



٠٩٨١٤٥٥٦٢٥

٠٩٨١٦٤٥٨٧٩

٠٩٣٢٣٨٤٠٩٧

Em Li Deskeftiyên Şehîdan Xwedî Derkevin



Kurdiyâr Direyî

Nakokiyên Partiyên Siyasî li Rojavayê kurdîstanê, di kirîza sûriyê de û hewildanên avakirina helwesteke kurdî li hember geşedan û bûyeran de, du alitî bi xwe re aniye, di milekî de partiyên siyasî di Rojavayê Kurdistanê de ku hemcêwiyên hevdu, û ji yek partiyê zêdebûne, xwe dibin sîwana encûmena niştimanî a kurd li Sûriyê ENKS de komî ser hev kirine, her weha Partiya Yekîtiya demokratik û hin partiyên din jî, tev li kesayetên serbixwe û rêxistinên civaka sîvil, dibin sîwana Tevgera Civaka Demokratîk TEVDEM'ê de xwe birêxistin kirin.. Hemû hewildanên yek-kirina helwestên herdu aliyan, ji ber

sedemên hundirîn û herêmî û nakokiyên partiyên kurdîstanî ve badi hewa çûne û bi demê re asta nakokiyên derbaskirin û ketin asta dijminatîyê û hevdu tunekirinê.. Tevgera Civaka Demokratîk TEVDEM ,projeya fedraliya demokratik dibin navê fedraliya Rojava-Bakurê Sûriyê de weke armanc bilind kiriyê her weha ENKS projeya fedraliya Kurdistanê Sûriyê weke armanc îlan kiriyê...

Pêşketinên TEVDEM'ê di hundirê Rojava de û roj bi roj lawazketina ENKS, hişt ku ENKS têkve gav-avêtinên dûrî berjewendiyên xwe weke tevgereke siyasî beriya ku dûrî berjewendiyên Rojava û xewnên kurdan bikeve, ta gihîste asta ku destê xwe têxe destê hovtirîn dijminên kurdan, mîna Turkiyê û mûxalefta Sûriyê ku ixwan elmuslimîn pêşengtiya wê dîke...

Hem jî ji neçarî, bêgavî, xwendina siyasî a şaş û hem jî ji ber berjewendiyên kesayeti ve, ta ku roja

îro herkes dizane bi taybet miletê kurd ku êdî ENKS gihîştîye asta mirîzindî bûnê....

Lê belê raşte ENKS tu encam ji kurdan re bi deşt nexiştîye û her weha projeya wê a fedraliya Kurdîstanê Sûriyê bi tenê weke durişmekê maye û ji raştiya xwe valabûye, Ema dijminên kurdan dikarîbûn pir sîdê jê bigrin, bi taybet dewleta Turkiyê ku herdem wan weke kurdên baş bi nav dîke, TEVDEM û Xweseriya Demokratik weke projeyê terorîstan bi navdike û eşkere li tunekirina wan digere...

Ji xwe dagîrkirina Efrînê û helwestên ENKS li hember vê daggerkiriye ku jêre li def û zirnê xiştîye, û weke serkeftinê bi navkirine, paşê têgihîştina ku êdî bi tenê ew destekbûn, bûye mîna guleya dawî di rastteqîneya netewperwerî û kurdayetiya ENKS de.

Lewra jî di vê demê de ku êdî Rojavayê Kurdistanê û projeya Xweseriya demokratik û hewildanên

avakirina Rêveberiyê gîştî ji bo bakûr û Rojhilatî Sûriyê re û gelemşeya siyasetên navnetewî û herêm, her weha Rêjîm û alîgirên wê li ser deverên rizgarbûyî ji hela QSD ve, pêwişt dîke ku em li hundirê xwe vegerin û di hemû warên ku lawazî û ne zelalî û nerasti heye em sereraşt bikin, bi taybet di milê siyasî, Aborî, Civakî û Leşkerî de.

- Di milê siyasî de; yekkirina helwestên tevgereke siyasî a kurd û avakirina sîwaneke siyasî a kurd di Rojavayê Kurdistanê de, temamkar be ji rêveberiya Bakûr û Rojhilatî Sûriyê re û vekirina derfetan li ber partiyên siyasî û dayîna roleke berbiçav ji wan re ku bi erkê xwe li hember Rojavayê Kurdistanê ve rabin, lewra pêwîste ku danûstandinên rasteqîne ENKS jî di nav de bi hemû aliyan re bibê, lê ne bi Rêveberên xwe yên ku destên wan di xerakirin û dagîrkirina

Efrînê û piştgiya Turkiyê û çeteyên Îtîlafê Sûrî kirine û dikin re .

- Di milê Aborî de ; xwedî-derketina li malbatên şehîdan û başkirina Rewşa wan a Aborî, her weha rêgirtina li ber perçemokên şevê ku deskeftiyên Rojava di xizmeta xwe û berjewendiyên xwe yên malbatî û kesayeti de bikartînin..

ji xwe gal-gal û gazincên ji nişticîhên Rojava bilind dibin ku êdî bêhna fesadê ji gelek sazî û dezgehên xweseriya demoqratîk difûre, her weha vekirina derfetan kar jî ciwan û perîşan û kedkarên re..

- Di milê civakî de ; guhdayîna li rêbazên pêşxestî û têgihîştina civakê de û xurtkirina beşdarkirina civakê di hemû pirojeyên ku pêşeroja wan xêz dîke de, rêgirtina li ber keyseperestiyê û bermahiyên Rêjîmê

ku li ser navê Xweseriya Demokratîk û tevgere rewşkirin, nakokî û tengasiyan derdixin, her weha ji holê rakirina bendî tî û hev-reqşirin, nebawerî û ne zelaliya rewşa heyî ango lêvegera li civakê û ji nava civakê gav avêtin..

- Di milê leşkerî de ; xwedî derketina li şervanên YPG, YPJ û QSD û paraştina mafên wan di hemû beşên jiyânê de her weha xurtkirina rêxistin û rêbazên berxwedanê û amadebûn ji hemû geşedanên re.

Di dawiyê de dema em weha diyarîkin, mebest ewe ku êdî em rê nedin ENKS ke din ku bi şewazekî din bi rengekî din bi navekî din ava bibe...

Em li deskeftiyên şehîdan xwedî derkevin ,di dema ku Rojava –Bakurê Sûriyê ber bi serkeftinê ve diçe .

Helwesta Emerîka û Hevbendên

Wê Ji Doza Kurd

Gotineka kurmancî heye dibêje: (yê dixeniqê, destê xwe tavêje kevwê jî) bi raştî jî ev sedê sala ye em dixeniqin û ti kesî destê xwe neda me û kevwê jî nehêlane ku em deşt bavêjinê. Piştî şerê cihanê yê yekemîn dewletên di şer de serketin, ev cihana em tê de ne li xwe par ve kirin. Her yekê herêmek jî xwe re girtiye û bi sed fen û fitî bi rê ve dibe. Bextreşiya me kurda ew e ku em bi derewan jî nebûn xwedî nav û nasname. Bi sedan dewlet hatin avakirin, lê ti cih nedane kurda. Tiştê em ji dîrokê tê digihin, neko kurd kêmî gelê dardora xwe bûn heya nebûne dewlet, lê xuya ye siyaseteka bi zanabûn li ser gelê kurd û axa kurdîstanê hatiye ajotin, lewma hemî tekoşîna azadiyê ya gelê kurd beravêtî bûye. Çi serhildanên kurdî yên ku li dijî dagîrkerên kurdîstanê rabûyî, bi alîkariya hêzên navneteweyî hatîye rûxandin, û pirê caran jî derfet amade kirine da kurd destê xwe ji neçarî bavêjin dūpişk û maran.. çendî ku di demna de hin dewletan xwe weke piştgirê kurdan jî nişan didan, lê çawa ku digihîştin berjewendiyên xwe, kurd jî kêr û satoreyên xwî-n-mijan re dihêlan û ew rû bi rû bi qirkirinê re dihiştin. Mixabin em miletekî dilnaz û dilpak in. (Kî dibêje me merheba, em wî datînin li ser kurk û eba).. em baweriyê bi her kesî tînin û jê piştiraşt dibin, ev jî vedigere nezani û sivikbûna me. Heya niha me nekariye dost û dijminê xwe jî hev veqetînin. Em xwe gelekî dixapînin û ji dîrokê waneyan dixapînin û ji dîrokê waneyan Pirofesorîkî wek Ismayîl Peşikçî jî hemî kurdan pitir kari-

ye rewşa kurd û kurdîstanê şîrove bike û dijminê wî destnîşan bike. Ew dibêje: kurdîstan mêtîngeheka navneteweyî ye, anku dagîrkerên kurdîstanê ne tenê deshilatdarên Tirk û Ereb û Faris in, gelek hêzên cihanî yên ditir jî hene hevparê van dagîrkeran e. Gelek jî me jî di rewşa îro de baweriyê bi dostaniya Emerîka û hevbendê wê tînin û dibêjin wê me biparêzin û me bikin xwedî statû.. va ye piştgiya YPG û Pêşmergeyan dikin, va hêza xwe li vir xurt dikin, wê me bi tenê nehêlin û gelek jî van gotinan..

Ka em li helwesta hin ji van dewletên zir-demokrat binêrin, dibêjin em li dijî terorê ne, em bi mafê mirovan re ne, em li dijî nijadperestî û cudahiya ne, li dijî binpêkirina zagonên navnetewî ne û hwd lê gava doza kurd li meydanê be, komkujî û qirkirin li ser gelê kurd be, hemî rengê mafê mirovan bêne bin pê kirin, ew demokrat bédeng in, ker, kor û lal in. Ji bo berjewendiyên xwe, pê li hemî prensîbên xwe dikin û gelê kurd dikin qurban. Naxwe kî nizane ku dewleta tirkîyê terorîst e, kî nizane ku Erdogan hevalbend û parêzvanê DAIŞ'ê ye, ma nabînin çî hovîtiyê li gund û bajarên kurdîstanê dîke, li Bakur, Başûr û Rojava.. lê ji ber ku ew jî dagîrkerên kurdîstanê ne, çavên xwe jî hovîti û harbûna seyê xwe digirin. Em xwe nexapînin ku ev dijminatî bi partîkî yan bi parçekî kurdîstanê tenê re ye, hemî hevneîrînin li ser bindest-mayîna gelê kurd e. Mixabin ku em hê negihane vê raştiyê. Em dibêjin ew li dijî PKK ne, li dijî YPG ne, li



Ciwan Dêrikê

dijî PYD ne, yan vî parçî yan wî parçî ne.. gelo em li referanduma li Başûrê Kurdistanê tenê binêrin ku bi hemî pîvanê demokratî yên navnetewî bi rê ve çû, em ê negihin raştiyekê ku hemî dewlet li dijî gelê kurd û nasnameya wî ne! Dagîrkeriya dewleta Tirk ji Efrînê re, ne pesendkirina vê nêrînê ye! Biryara Emerîka ya li dijî her 3'ê şoreşger û pêşengên şoreşa kurdîstanê(Murad Kareyîlan, Cemîl Bayîk û Duran Kalkan) jî bilî bêbextî û dirûtîyê çî nişan dide! Gelo Trump û koma kur û çavsorên li dor wî ne hevparê terora Erdogan û hemî diktatorên cihanê ne!! Divê em bigihin bawerî û raştiyekê ku dewletên zil-hêz ev cihan li xwe parvekirine û heya ji wan bê nahêlin guhertin çêbibe. Derewa herî mezin jî ya ku pê gel û civakan bencî dikin û dixapînin (demokratî û mafê mirovan e). Tiştê di destê me de nemaye jî bilî em jî hemî hêlan ve (siyasî, leşkerî, rêxistinî û .. hwd) xwe xurt bikin, li ser nîrx û felsefeya xwe, xwe bilind bikin, yekîtiya navxweyî ava bikin, gemarê ji nav xwe bavêjin û bi hişmendiyeka ditir tev bigerin, hingî heçê tehfekê li me bide û me bavêje avê, em ê xwe bi stûn û benê xwe bigirin û deşt navêjin kevza dagîrkerên navneteweyî jî.

Siyasetên Kurdan

Ji Yê Her Demê Zîrektir in


Rewşa niha ku kurdan û şerê rûwan ji bo hebûn li hember xire-cir û qerebalixeke berfireh û mezin cihê nîqaşê ye. Jixwe ez ê careke din dubare bikim û bibêjim ku berê gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê li xêrê ye û siyaseta ku niha Kurd dimeşînin, çî ya Qendîl û çî jî ya Erbilê be li seranserê Kurdistanê û tevahiya herêmê zîrektirîn siyaset e. Ev yek ne nerîneke take-kesane bêtir ku raştî ne, kî jî xwe re niha li heft-heşt salên vê dawiyê vegere û bûyerên ku li Başûr û Rojava rûdan careke din bişopîne, êdî ev bawerî li cem jî peyda bibe. Li bajar û deverên din ên Sûriyê jî wêrankariyê, talaniyê, girtinê û kuştin rojane pê ve tişteke din tine ye, ev ji bilî ku nexweşî û xizani li wan deveran pire û pirtir dibe, zarokên wan jî xwendinê bê par mane, lê em dibînin ku xelkên herêmên Kurdî li Bakurê Sûriyê di jiyaneke xweş de ne, dibe ku rewşne awarte jî hebin, lê bi awayekî gîştî rewşa aborî û rewşa xwendina dibistanan û ya tendurîştî jî xelkên herêmê re û zarokên wan re bi gelekî çêtir e ji ya deverên ditir. Lê di ser wilo re jî metirsi hîn hene

û xelk hesaban dikin, xelk li jiyanê xweştir û naziktir ji xwe û zarokên re digerin.

Tirkîyê wê nikarîbe ji wilo bêhtir pê de here û naxwaze jî, ji ber ku mebest jî çîrokê tevî ne bêhn-çikandina Kurdan e (wek çawa ku xelk bawer dikin û jî wan werê wê Tirkîyê me ji wî welatî hema wilo rake û kirasê xwe û hevalbendên xwe li xelkên deverê bike) mebest jê qirkirin û tunekirina rikberiya Sûrî ya çekdar e, ji ber ku Emerîka wê nehêle û nahêle ku welatek di hundirê welatekî de ava bibe, nahêle ku komikên çekdar bibin xudan serdestiyêke siyasî û jî ber hin sedemên din jî ên girîngtir, ku ez wan li vir mixabin nikarim bibêjim.

Rewşa niha li Rojhilatê Firatê di nerîna min de bi carekê re ne metirsiyar e û mesele tenê demikî ye û her tişt jî xwe jî berê ve çarçovekirî ye û kesek jî aliyên beşdar di prosesên leşkerî û siyasî de niha li Sûriya nikare jê derkeve û ev şert û merc li ser tevahiyan dimeşe.

Ji kurdan re her tişt jî niha ve zela û xuyaye, Fedralî û Sûriyêke ne-navendî, demokrat an na, ev



Alan Pîrê

ne gelekî girîng e ji ber ku dibe weha be û dibe na jî (welatek ku nih jî nav lepên şerekî navxweyî derkeve, kes nizane bê çî dikare lê biqewime) û hemû herêmên ku niha Kurd lê serdest in û jî wêran û terora Îslamîstan tundrew paraştî ne wê bi ser Başûrê Kurdistanê ve vebin.

Çawa ku avakirina erd û insan jî wê gelekî li paş nemîne, heger mirovê Kurd yê li hundir û yê li Diyasporayê xwedî li welatê xwe derkeve. Ez careke din dixwazim giraniyê bidim pêdîviya gelê Kurd bi geşbiniyê, ji ber ku û bi raştî berê me li xêrê ye û tirs ne ji derve ye, tirs bêhtir di serê me de ye.

Tîrsa çûna welatekî bi hatina çend leşkerên Tirk ser sînorê me, tîrsa mana ji statuyekê ji rêveberî û xweseriyêke demokrat bi çend gef-lêxwarînan ku jî derve ve tên. Ev metirsîyên zarokane divê zanê Kurd layîqî xwe nebîne.



Bi xêr hatî Birêz Nûrî Mehmûd spas dikim.
Gelek spas hûn jî bi xêr hatin.

- Hemanê Yekser deşt bi pirsên xwe dikim Piştî civîna çar alî ya Îstenbolê ya di navbera Fransa, Elmanya, tirkiyê û Rûsiyê de pêk hat, mirov dikare bibêjê peymaneke ser Rojava hat saz kirin, gelo di vê çarçoveyê de Dewleta dagirker a tirk şewqa kesek jî kê şend ?

Civîna ku li Îstenbolê çebû, di encamê de mirov nikare hemû aliyên beşdar têxe yek siwanî û bibêjê ku hemû wekî hev difikirin, her çar alî cûdayî hev du difikirin, li gorî şopandina me jî wê civînê re Tenaqudekî pir mezin di derûniya wan de hebû, jî xwe di derheqê wê civînê de jî ti biryareke berçav tine bû.

Deştûrekî nû jî Sûriyê re were nivîsandin û li ser wî esasî hemû pêkhatê tevî bibin.

Em jî bi vê yekê re ne. Lê belê ya balkêş di wê civînê de helwesta Serokmarê Tirkiyê Erdogan bû.. Belku Erdogan xwe alternatîfê çareseriyê Aloziyê dibîne.

Yanî Nexşeya Tirkiyê û Sûriyê esas nagire, heta heta hemû nexşeyên herêmî jî deşt nagire.

Erdogan dixwaze Nexşeya Kevin ya Serdema Osmanî carda li herêmê çê bike û bide qebûl kirin.

Çiografîya herêmê jî bo Tirkiyê, Ewropa û Dewletên Rojavayê îstixlal dîke..

Di wir de armancên xwe anî ser ziman û pir bi eşkere Bakurê Sûriyê hedef girt.

Di vir de jî tê fêhm kirin ku ew civîn ne mumkîne bibe nimûneya çareseriyê li Sûriyê..

Civîna Îstenbolê mîna yên beriya xwe Mûcered ji Heqîqeta ser erdê hat lidar xistin, Lewra bi ser neket.

Binêrin yekser piştî civînê qediya, Artêşa Tirk deşt bi komkirina leşkerî ser sînorê Rojava û Bakurê Kurdistanê kir.

Ev komkirina leşkerî jî, jî bo hewarçûn û alîkariya DAIS'ê ye. Di roja 1'ê Mijdarê xwestin tola şikeştina DAIS'ê ku ser deştê Şervanên me têkçûn hilîne û wê roja serkeftinê tarî bike.

- Gelo ev êrişên dagirkeriya dewleta tirk ser Kobanê û Girê Spî tê çî wateyê, di vir de ne tenê herêmên Rojhilatê Firatê, Lê belê car-caran dagirkeriya dewleta tirk herêm yan jî bajarên Cizîrê jî top û gulebaran dike, Mane Hedef Rojhilatê Firatê Çima Êrişî herêmên Cizîrê dikin ?
Rojhilatê Firatê Dirûşma ye ev pêkeniyeke, Esas cihê ku Ixwan Mislîmîn xwe lê îlan kiribûn, Cihê ku DAIS xwe lê îlan kiriyê û herî dawî tê de bi bin ketiye. Erdogan bi wê hişmendiyê dixwaze her derê îlan bike qada şer, ev projeya wî ye.

Ixwan Mislîmîn li Sûriyê Pilana Erdogan a Tîpa B bû, DAIS'ê jî pilana wî ya Tîpa C bû.

Dema ku şofînzîma Ixwan Mislîmîn û Fîkrê DAIS'ê yê Radîkal bi bin ketin, Armanca Erdogan bû herêmên ku demokrasiyê lê hatin îlan kirin angû herêmên Bakurê Sûriyê bûn.

Dema ku dibêje armanca me operasyoneke li Rojhilatê Firatê ye esas ne ew e, dixwaze herêmên Demokrasiya gelan hedef bigire.

Di heyama van êrişan de darbeyên leşkerî pêk bîn, mînak mîna li Efrînê bû li herêma Cizîrê jî dubare bibe, bi rastî ev nîgeraniyeke pir mezin di nava xelkê de çekiriyê çî tedbîrên we hene ?

Bê guman tehîdekî pir mezin e, gerek dîke ku gelê me vê baş bizanibe mîna ku bê exalqî û bê hiqûqîya ku li Efrînê çebû, di serî de di şexsê Rûsiyê de ye.

Li beramberî wê jî berxwedaniyeke bê hempa hat meşandin, lê jî ber êrişên dijwar û qetilkirina sivilan biryar hat girtin gel ji Efrînê der biçe da ew gel were rizgar kirin, Lê belê Şervanên YPG û YPJ li wir şer dikirin.

Heta niha jî piştî dagirkeriya Tirk Şervanên YPG û YPJ'ê çalakiyan li Efrînê lidar dixin.

Ti carî wê Efrîn jî Dagirkeriyê û Terorê re nebe cihekî bi ewle.

Binerin dewleta dagirker a Tirk Nemûzêci li Serêkaniyê û Girê Spî bû, dixwaze li herêmên din bisepine.

Binerin Nemûzêci DAIS'ê li Efrînê carda pêk hat.

Dizî, Talankari û Wêrankariya heyî Şeweyê DAIS'ê ye.

Em wekî Yekîneyên Parastin Gel YPG her wiha beşekî ji Hêzên Sûriya Demokratîk HSD di wê zanebûnê de ne û li gorî wê tevdiagerin.

Çi kesê ku îro li Bakurê Sûriyê jiyay dîke, Gereke vê berpirsiyariya parastinê hilgîre e.

Carda Helwesta ku tê çaverêkirin jî aliya Hêzên Navdewletî bê nişandan derneketiya holê.

- Erdoganê AKP'Yî beriya niha jî di konferansê li Enqerêyê de behsa Şengalê kiribû gotibû em ê ji Rojava deşt pê bikin heta em bighîne Şengalê ya Başûrê Kurdistanê Bê guman xewn û xeyalên wî mezin in hûn çî jêre dibêjin ?

Erdogan behsa Wîlayetên Mûsil, Bexdad, Heleb, Sam û Qudîsê dîke.

Li gorî Erdogan Ew Qesra li Enqerê tî daye ku jî dizayin Cengîz Xane hişmendiyê Osmanî, Mexûlan jiyay dîke.

Hincet Rewabûna xwe ye ku Kurd li Şengalê ne, Ema Armanc hîm û hîm mezintir e.

Me ev hemû Rewabûn û zihniyet Şofînzîm li Şengal û herêmên din bi bin xişt..

Em dizanin îro gelên li Tirkiyê jî vê şofînzîma Erdogan bi hêrs in.

Binerin Siyasetmedar, Leşker, Karmend û Rojnamevan hemû di zindanê de ne.

Peyvdarê YPG Nûrî Mehmûd: Gereke Civak Di Pozîsyona Parastinê De Cihê Xwe Bigre

- Civîna li Îstenbolê çê bû, bê encam bû û ti biryareke mesûrî jî bo gelê Sûriyê derneket holê
- Gefa Operasyona li ser Rojhilatê Firatê tenê dirûşme, Armanca dagirkeriya dewleta Tirk Rojavayê Kurdistanê ye.
- Eger Êriş ser herêma Cizîrê û herêmên din yên Rojava pêk were, divê gelê me seferber be û berxwedaniyê bike
- Em ne jî bo Emerîka şerê DAIS'ê dikin, Em jî bo Azadî û serfiraziya gelê Qamişlo û herêmên din vî şerî dikin
- Me Ji Emerîkayê re negotiye werin alîkariya me bikin, Serkeftinên me hişt Emerîka bê cem me..
- Tifaqa me li gel Emerîkayê Leşkerî ye û ti soza avakirina Kurdistanê li Bakurê Sûriyê nedaye me.

Hevpeyvîn: Berzanî Ferman

Erdogan di 70 saliya xwe de ye û hîn jî hewil dide ku Îmaratên Erdoganî ava bike.

Em heman çarçoveyê nîqaş bikin Endamê Femandariya Biryargeha Navendî ya HPG'ê Bahoz Erdal gotibû divê Kurd xwe jî şerekî demdirêj re amade bikin wateya vê gotinê çîye, Gelo Rojava û her 3 aliyên din yên Kurdistanê di nav de ye gelo?

Bê guman nerînên Bahoz Erdal nerînên wî ne, Em wekî Yekîneyên Parastina Gel û Hêzên Sûriya Demokratîk HSD'ê di mefhumê parastina rewşa de hêzeke bi rêxistinî kirin ne.

Çi Êrişa ku bi ser me de were bê tereddûd em ê bersiva wê bidin û parastina xwe ya rewşa pêk bînin. Em dixwazin li Bakurê Sûriyê îstqar û aramî çê bibe. Em dixwazin ku li Sûriyê çareserî û prosesên Siyasî pêş bikevin.

Artêşa li hember DAIS'ê bi bin ketin, Hêza ku li ber xwe da YPG'ê bû Koban jî nişaneyê vê ye.

- Di ragihandina cihanê de derket holê ku, Koalîsyona Navdewletî ya şerê dij be DAIS'ê ser zimanê berdevkê wê Rayan Sean eşkere kiriyê ku „bûye navbênkarê HSD'ê û Dewleta Tirkiyê da şerekî navxwe çênebe hetanî çî radeyê ev nûçe rastê, yanî em dibînin ser sînor hevrikiya parastinê dikin û hemdem piştgiriya du aliyên dikin siyaseta bi vî rengî çawa tê nixandin ?

Tişteke wiha jî rêzê ye, dunya û Alem vê baş dizane ku ti Tenaqudekî me bi Tirkiyê û gelê Tirkiyê re nîne. Tenaquda heyî bi Deşhildariya heyî re ye, Ew dijminatîya me dîke. Di sînorê me de ti xeterî ser Tirkiyê nebû, Li hember terorê li Girê Spî û hin herêmên din gelê Tirkiyê alîkariya me kirin.

Ê ku Nakokiyan di navbera Gel Tirkiyê û Sûriyê de diçe Erdogan e, ti problemê me bi Tirkiyê re tine ye.

Însiyatîfên Emerîkî yên bi vî rengî di cih de ne, belku me şer nexwestiye me aştî û aramî xwestiye.

Em dixwazin Tirkiyê wekî dewleteke cîran danûstandinê li gem bike.

Carda dibêjin navxwazî Tirkiyê bibe welatekî aram jî bo Terorîstên mîna DAIS'ê.

Erdogan û AKP'ê saziya leşkerî ya Tirkiyê wekî alavê şerê li dijî me bikar tîne.

Di serdema Erdogan de yekem-car Aboriya Tirkiyê bi bin dikeve û Tirkiyê bû navenda Çekdarên Cihadîst.

Erdogan dibêje Ger Emerîka Doştaniya min neke, ez ê dostên nû jî xwe re bibînim.

Digotî Emerîka Hûn Hevaltiya YPG'ê bikin, ez teklîyên xwe bi were qut bikim.. Bi rastî şeweyê Erdogan Şeweyê Deştîldariya Serçeteyekî ye.

Erdogan ku dewleta wî berendamekî Yekîtîya Ewropayê û artêşa wî yek jî artêşên herî mezin yên NATO'ye şeweyên Serçeteyekî dimeşîne.

Pirsgirêka Cidî ew e ku Têkliya Gelê Tirkiyê pê tine ye ku Erdogan

deşt daniye ser Tirkiyê û wê li gor xwe dizayan dike.

Divê Tirkiyê bibe welatekî demokratîk ku bi rengê aşitiyan li gel cîranê xwe bide û biştîne, her wiha pirsgirêka ewlehiya hundirîn a Tirkiyê û Bakurê Sûriyê bi hev re çareser bikin, mîna Îraqê û Bakurê Sûriyê kir, em dixwazin vî yekê bi Tirkiyê re jî pêk bînin di pêşerojê de..

Diyalog pir girînge, Dubare ti pirsgirêkên me bi gelê Tirkiyê re tine ne, tam ters e - em dixwazin bi bin cîranekî baş jî bo Tirkiyê.

- Bi rastî gel dipirse Emerîka helwesta wê çîye, heta heta gote-gotinên bi vî rengî derdikevin ortê ku Emerîka xwe jî piştî Kurdistan da aliyekî, yanî piştî qedandina DAIS'ê ti proseseke siyasî bo Bakurê Sûriyê nexistiye rojava xwe hûn çawa li vî helwestê dinêrin ?

Emerîka ti soz nedane me da deştê xwe jî piştî me bikîsin, stratîjîya Emerîka bi mere daniye, me bi raya giştî re parve kiribû.

Yek jî van stratîjîyan şerê li dijî DAIS'ê ye, Ya duyem jî bo îstqarê Sûriyê tevbigirin, Ya Sisiyan jî Ji nûve-avakirina Sûriyê me li hev kiriyê.

Emerîka her dem diyar dikir Hevalê Dewleta Tirkiyê ye, ya dîtir û bila gelê me vî baş bizanibe em neçûn cem Emerîka, Emerîka hat cem me.

Serkeftinên me li Kobanê de, hişt ku Emerîka doştaniya me bike.

Berî Emerîka bê cem me Emerîka bi gelek hêzên din re dida û diştên.. Emerîka bi Qaşo Artêşa Azad re danûstandin dikir.

Heta ku fêhm kir Heqîqet çîye, Hat gel me.

Emerîka jî bo berjwendiyên xwe li vî derê yî.

Em in ew hêza civakê ku Emerîka bi mere dide û diştîne.. Berejwendiyên Emerîka li gel me hene, yê me jî li gelê wê hene.

Hêviyên me nînin ku Emerîka jî mere ştatîyêkê ava bikin û parastin me bikin. Em jî jî xwe re bixwin û vexwin, Gereke em welatê xwe biparêzin.

Ya girîng bi Emerîka û Koalîsyona Navdewletî re ew bû ku em Terora Cihanî DAIS'ê tîk-bîskînin.

Tiştê jî Emerîka û Hêzên Navdewletî tî xwestin heqîqeta sîstema Demokratîk li Bakurê Sûriyê baş bibînin.

Ev dewriyaten ku li ser sînor bi hevriyatiya me pêk tîne dida xuya kirin ku bi wê berpirsiyariya xwe radibe.

Li aliyekî din Emerîka Windahiyan şerê herî kêm li Rojhilata navîn da, şerê li dijî DAIS'ê bû.

Li Efxaniştan, Îraq û Vîtnamê, li gelek cihên din windahiyan wê yê mezin hebûn.

Bila Carda gelê me Hişyar be, Kesek yan jî dewletek bû me Kurdistanêkê ava nakin.

Bo yî me Kurdîtiyê çê bike, welatekî îlan bikin.

Eger em ne birêxistinîkirin bin ev tişt ne pêk anin.

- Em ê behsa Helwesta Rûsiyayê

jî bikin, Peyvdarê Wezaretê Parastinê ya Rûsiyayê Igor Konaşenkof gotibû Emerîka û Kurd nikarin herêmên xwe biparêzin, yanî helwesta Rûsiya Geh Dijber e Geh jî xwe dostê yekem yê Gelê Kurd dibîne ev çî tektîka ku Rûsiya dimeşîne ?

Dilê wan dixwaze, tiştê li Efrînê bûyî li herêmên dinê jî pêk bê.

Ew dixwazin dewletên NATO'ye bera hev bide, yek jî wan jî Tirkiyê ye.

Bi rastî Erdogan jî pêşengtiya karekî bi vî rengî dîke.

Ji bo ku Erdogan ser Deştîldariyê bimîne, Çetebûnê li gel hemî dewletan dîke yek jî jî Rûsiyê ye.

Erdogan wekî Xencerekî di piştî NATO'ye de ye.

Lihevketina di navbera Erdogan û Bakurê Sûriyê de te wateya Tinaquda di NATO'ye de.

- Ji bo rewşa siyasî ya mala Kurdî, hûn wekî hêzeke leşkerî çawa nêzi van nakokiyan dibîn, û helwesta we jî bo wê mijarê wê çî be, eger êriş hat li ser tevahiyan deverên kurdan?

Kurd ne bê çare ne, Kurd di dîroka borî de serkeşiya wan Axayekî, Serok Êlekî dikir.

Aniha ne welê ye, Kurd Diplomasîya wan heyê, Kurd êdî sîstemekî wan heyê, Kurd nîha perwerdekîriye ye û saziyên xwe daye ava kirin, Naxwaze Tadeyê yan jî zirarê bighîne ti miltekî derdor.

Di heman demê de dixwaze Nasname û hebûna xwe biparêze.

Kurd jî serdemên berê ve beriya 1500 salî ve zanatirin.

Ti hevriyê hev bike, kurd êdî şerê hev du nakin.

Dijmîn bi listokên xwe dîke nake nikare Şerekî navxwe navbera Kurdan de biafirîne.

Kurd ketine wê ferqê de ketin wê zanabûnê de, her wiha rêxistinbûyîna xwe pêş xistîne.

Hindek nakokiyan Partîyan û hizbên hundirîn hene, lê belê bila ev nakokî serê wan bixwe yanî.

Ji bo Kurdan rêxistinî pîwişt e.

Civaka kurd qasî ku di warê leşkerî de hebûna xwe mayînde kirî, di qada siyasî de jî xwe nîşan daye.

Li cihanê her dewleta mîna Rûsiya propogandaya sîlahên xwe dike, Lê kurd projeyê dane pêş û jî raya giştî re radighîne.

Artêşên ku teknîkên herî zêde li gel wan hebûn li hember DAIS'ê bi bin ketin, Kurd bi zanebûyîna şerê xwe karîbûn dawî li Efsaneyê DAIS'ê bînin.

Me wekî YPG û YPJ'ê terora Cihanî tîk bîr..

- Rewşa eniyên şerê karê leşkeran e, lê gelê Kurd jî we dixwaze ku hûn şer rawestînin, û lingê amerîka tîxin soleke teng de, da ku bi awayekî eşkere bête Tirkiyê li vir û bes e?

Propogandaya ku derketiye holê dixwazin tevlihevîyan derxîne ortê. Şerê me yê li dijî DAIS'ê ne jî bo Emerîkayê ye. Bila kesek gel nexapîne.

Şerê me yê li dijî DAIS'ê, ji bo azadiya gelan e.

Ger me şerê DAIS'ê nekîrbaya, hewce nedikir ku Tirkiyê

artêşa xwe tîxişte herketê, hemen hemen DAIS'ê wê bihata bikaranîn. Me dît ku heta Hesekê demokratîk nebe, Qamişlo nikare bi azadî jîyan bike.

- Li gorî agahiyan we gelo wê Tirkiyê karibe derbasî Qamişloyê bibe, û hîn navendên Rêjîma Sûriyê lê hene?

- Li vir eger ew êriş çebû, wê helwesta Rêjîma Sûriyê çibe?

Me Li Efrînê dît ew e, Artêşa Sûriyê ku jî erkê wê ye xaka xwe biparêze, me bang kir lê me jêre gotî ti artêşa Sûriyê yî were Sînorê xwe biparêze, Ema bê guman jî cihê xwe jî gavekî pêşê navê.

Me Ji Rêjîmê re got were tu ji aliya Neteweyên Yekbûyî û Peymanên navdewletî ve îtiraf bi te tî kirin were sînorê xwe biparêze, Lê belê cesaret nedikir

Li vî derê çî dibê nizanîm...

- Hûn dibêjin emê berevaniyê bikin, lê hûn nikarin li ber firokayên Tirkiyê berdevem bikin, wê çare çibe?

DAIS'ê dema êrişî Kobanê kir teknîkeke pêşketî li gel wê hebû, Li Efrînê jî Artêşa Tirk teknîkên herî pêşketî wiha bû, Li Cepheya Şer çîqas ma û nikaribû yek gavê bavêjin, Belku gel şer kir û berevaniya xaka xwe kir.

Binerin heta demekê jî nikaribûn gavekê pêş bi-avêjin li Efrînê.

Me Wekî Hêzên YPG'ê terzê Gerîlayetî pêş xistî û mil bi milê gel me xaka xwe paraşt

Em di çalakiyên xwe li dijî dagirkeriya li Efrînê de berdevam bin.

Ji 7 salî heta 70 Salî gerek dîke li dijî dagirkeriya Tirk bisekin û nehelî ev xak were wêrankirin.

- We jî Emerîkayê xwestiye ku "herêmên dij balefir" biçespine?

Bê guman em jî hemû cihanê dixwazin ku herêmeke dij balafir li Rojavayê Kurdistanê were çespanandin da ev herêm jî êrişên Tirkiyê yê hewayî were parastin.

- Pîrsa dawiyê birêz Nûrî Mehmûd Bê guman gelê Rojava êrişên dagirkeriyê proteştî kir û helwesteke dijber nîşan da, bawer dikim moralekî bi hêz dide we, tiştê ku hûn bixwazin jî gel re bêjin di vî qonaxê de Çîye ?

Bê guman em di pêvajoyekî mesûrî de ne, Bi hev girtin û rêxişibûna civakê me Erdogan û partiya wî AKP bi bin xişt, di heman demê de me baskê El Qaidê li Sûriyê Cebhet El Nûsra, Terora Cihanî DAIS'ê me bi bin xişt, Lewra gerek dîke her kurdek xwe bi rêxişin bike wekî şervanekî û siyasatvanekî.

Îro ew roje ku em pêşeroj û çarenivîsa xwe li vir diyar bikin.

Wekî Yekîneyên Parastina Gel YPG û HSD'ê gelê xwe dawetî vî hêzê dikin ku xwe tî de bi rêxişin bikin.

-Zor spas Bi rêz Nûrî Mehmûd Peyvdarê Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê ser nixandinê te.

Spas ji bona we jî

Serpêhatî

DENG JI HESENO NEHAT



Dildarê Mîdî

Serê sibehê Heseno ji xew rabû , taştîya xwe xwar û çû qantirê xwe ji koxê deranî û barê xwe yê genim li ser pišta wî kir,da ku bibe aş ji kuffetê xwe re bihêre .

Di wê demê de , Helimê jî cîrana wî bû heme ji wêde hat û got :

Kekê Heseno ez di bextê te û xwedê de me , bê guman tu diçe aş tu karibe min jî bi xwêre bibê , çimkî ez dayika sêwiya me û ez pîrekim darê şikeştîme , wekî tu dizanî kesî min tune ye û ez bi tena xwe jî nikarim herim , tu dizanê ku diz u muxlacî û eşqiya hene dê bikevin rêya min û arvankê min jî min biştînin , yan jî gur , teba , wê kerka min bikujin wê demê serê zarokê min tê birin û em dê li Erdê bê mihwar bimînin .

Heseno nemedî ne kir û got :
Li ser herdu çavan xuha min , bi lez xwe amede bike ez li benda te me .

Jinê li bayê bezê arvanê xwe avête li ser pišta kerê û da kêleka Heseno û bi rê ketin , rê jî dûr bû , qasekî meşîyan dîtina dîtîn , heme ji nişka ve singa wan û cotek gurên har li hev raşt hatin . Heme di cî de Heseno yek nekir dido got himha xwe avête pişt kevîrê û ne him û ne gum .

Lê Helimê qet kêmasî nekir , heme bi qîjan , daran û keviran pineha navserê guran û kera xwe ji nav lepên wan xelas kir .
Lê herdu guran bi hevdu êriş birin ser qantirê Heseno , qantirê wî kuştin û reviyân .

Helimê li Heseno zivîrî û got :
Herambê kekê Heseno , te qet li ber xwe ne da û tu deng ji te nehatî .

Heseno li Helimê veğerand û got :
Bi xwedê cîrana Helimê , eger te zexelî ne kirbaya teyê qantirê min jî , ji nav lepên guran rizgar bikra ...!!!!

29'emîn Festivalî Filman a Stockholmê bi pêşandana Filman berdewam dike.

Yek ji Filmên ku bala Rağîhandina Siwêdî kişandiyê Filmê Keçên Rojê ye.

Ev Film berhema derhêner Eva Hûssoon e û li Gurcîstanê hatiye kişandin.

Naveroka vî Filmî behsa berxwedana û têkoşîna jina Kurd li dijî çekdarên DAÎŞ'ê ye.

Aktora navdar a Îranê Gulşifte Ferhanî rola sereke di film de dilîze.

Çiroka vî Filmî di rêya Jineke Rojnamevan a Fransî ve hatiye vegotin..

Akterê bi nave Zîrek ku di vî filmî de rola fermanerekî Pêşmerge dilîze,beriya niha bi cil û bergên xwe tevî Festivala

Filmê "KEÇÊN ROJÊ" Beşdarî 29'emîn Festivala Filman Ya Siwêdê Bû

Cannesê bibû.


Her wiha Aktora Faris Behî Cenetî Eta rola Parmentera Krud Viyan Dexil dilîze..

Û bi gîriyê xwe bala cihanê kişand ser Felaketa Şengalê.

Di Festivala Cannesê de Golshifteh Farahanî ku rola Mon Roj di Filmê Keçên rojê dilîzet xelata baştîrîn akter wergirtibû.

16'ê Îlona 2018'an heman film li Festivala Navdewletî ya Filman li Silêmaniyê hatibû pêşandan.

Tê payîn ku festival 12 rojan dewam bike û ev film 3'ê caran were pêşandan.



Silva Elî

Hin nivîskarên Kurd dibêjin ku, hin serok hoz û êlên Kurd jî jin hebûn, vî ramanê weke bingeheke civaka Kurd tekez dikin.

Û vî yekê dikin minaka wekheviya jin û mîrên civaka Kurd, beramberî gelên Rohîlata Navîn.

Û hin netew-pereştên Kurd dibêjin ku mafê jina Kurd weke yê mîrê Kurd hebû û piştî ku ola Misilmaniyê hat, ew maf jî jina Kurd hate şandin .

Hem jî Împeratoriyên mezîn,ên

Wekheviya Jin û Mîr Di Civaka Kurdan De

weke Faris û Osmanî. bûne sedema ji deşt çûna mafê jina kurd.. lê belê divê aşkere û diyar bibe ji bo pênasîne, ku ev guman û qerwêlên bi vî rengî yên kesên mîna Diyi Xalib bûn (ew yek ji damezrînerên netewa turk bû lê- zayinda wî, jî bingehên netewa Kurd bû)...

Mûsa Enter jî gotarek bi navê Ciyê jinê di dîroka Kurdî de nivîsiye..
Û têde daye nasîn û ravekiriye ku asteke bilind ji wekheviya jin û mîr di civaka Kurdî de heye û di dema Misilmaniyê de jî jina Kurd ne mîna gelên misilman bû, anga bi şeweyekî berbiçav be li xwe nekiriye û li nav civakê jî mîr cihê nebûye.. Ji bilî hin malbatên Eriştokratî, birciwazî, olperest û fewedal ku ew weke adet dûrî civakê bûn.

Demî ku şer li navbera du hozan derdiket jinên Kurd, eşkere çek û cebilxane ji mîran re dibirin û beşdarî vî şer dibûn, bêyî ku tu kes wan vegeçîne an jî karibe rê li ber wan bigire û wan rawestîne...

Hem jî hin serok hozên Kurd di gotara Mûsa Enter de bi nav bûne mîna Edla Xanim ji Helepça, Perîxan Xanim seroka hozî Reman û navê kurê wê Emînê Perîxanê bû, anga bi navê dayikê nas bûye.

Şemsê Xatûn ji êla Omeriyan û navê kurê wê Mîhemedê Şemsê û bi navê dayika xwe serbilind bû...

Jî bîr nabe ku hin jinên ditir ji Kurdên Êzîdî jî navdar bûn weke Mîyan Xatûna ku dilreq û zîrek bû û gelek jinên din wê demê hebûn.

Lê Mûsa Enter serokatîya wan jinan bi kuştina mîran ve girê dide, anga li pê kuştina hevjinên wan,ew bûne serkêş, hem jî Oly Çelebî navdariya hin jinan li bavên wan vedigerîne.

Lê belê hemû jinên serok eşîr bi navên xwe hatine hildan û ne bi navên mîran

Û hin mîr jî bi navên jinan navdar bûne, weke mînak: Êsama paşayê Helepça, bi navê "Hevjînê Edla, hem jî Hevjînê Xanim" dihate naskirin.

Li dema Sultan Selîmê 4'emîn Xanimê Kurd bi navê "Xanzade Sultan" salara artêşekê bû

Ew artêş, 12 hezar leşkerên çekdar û deh hezar xedengvan bûn û wê jî bi şûrê xwe li ser pišta hespê hempayî lehangê Êranê yê bi navê "Sam kurê Narîman" şer dikir, Dêdora 40 hezar şerwanî êriş birin ser Hemedan,Dargîzîn û Çemcênabê herdem jî bi mîzgîniya serkeftinê vedigeriya...

Herêma Soran piştî 200 salî jî Xanimê dinî Kurd "Qere Fatma ku bi Xanima Reş dihat naskirin li hemû Rojnameyên Ewropayê de nav û dengê pê ket.

Demî ku di şerê girava Qerm de roleke mezîn lişt, ew jî ji

Mereşa Bakurê Kurdiştanê bû. Heta roja îro jî li her deverên Kurdiştanê asayî ye ku êl yan jî malbat û binemalên Kurdan bi navên jinên navdar hatine naskirin û paraştin heta niha jî navê wan eşîreyan heye û meşhûrin..

Ji vî şîroveyê tê nasîn ku zayînd li nav Kurdan ne pirsgîrêk e ji bo serkêşî û navdariyê çî jin çî jî mîr be...

Ango jî civaka Kurd re ne kêmasî bû ku jina Kurd serkêşiyê jî civakê re bike civakê Kurd cuda bûn, ne mîna gelek civakên millet û gelên Misilmanan bûn.

Jina Kurd di dîrokê de weke evîndar jî li nav civaka Kurd hatiye naskirin û li ser xaknîgariya Kurdiştanê role liştiye mînak jî pir in weke : Taxmîna û Rîstemê Zalê, Stîya Zîne evîndara Memo, Şîrîn û Ferhad, Mîdya û Salar, Elo û Fatîmê, Edûlê û Derwêş, Koçera Homanê, Têlî Eyşê, Seyran Xatûnê, Hemawend û Şerîfo in...

RÊZIMAN

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 8

Zimanê Kurdî yek ji zimanên malbata Êranî ye. Ew malbata ku ji zimanên Kurdî , Farisî , Bilocî , Baştuyî , Osetî û hin zimanên ditir jî pêk tê.

Girêdana vî malbata zimanan bi koma zimanên Hîndo-Ewropî û yê Hîndo-Êranî re jî heye. Bi egera vî girêdanê jî gelek bêje û derbirînên cûrecûr di nav wan zimanan de hevbeş in. Ferhengên wan zimanan jî wê girêdan û pêwendiyê berçav dikin , mirovantiya wan gelên ku bi wan zimanan diaxivin tekez dikin. Anku ew ziman tev, weku zimanîne serbixwe li koka xwe ya "Arî" vedigerin û li wê koka digihêjin hev.

Hin dîroknas û lêkolerên zimanên dêrîn (kevin) dibêjin , ew dabêşbûn û şaxvedana wan zimanan , bi vî piranî

û belavbûnê jî encama wan koçberiyên êl û hozên gelên Arî ye.

Di serdemên kevin de gelên Arî jî cihwarê xwe (nêzî der-yaya Xezere) bi çend pêlan koçber bûne .

- Koçberên pêla yekem ber bi rojava ve koçber bûne û li parzemîna Ewropayê belav bûne. Li wan herêm û navçeyan niştîcî bûne .

- Pêla duwem jî, berû başûr (kendava Farisî-Erebî) û ber bi rojavayê (Qefqasiya) ve çûne û heta bakûrê der-yaya Xezere belav bûne .

Ew êl û hoz bi navê gelên Êranî hatine nasîn û zimanên wan jî bi navê: malbata zimanên "Êranî" dihatin naskirin

- Pêla sêyem jî berû rojhilat û başûr ve çûne. Ew koçber bi navê gelên "Hîndo-Êranî" hatin nasîn, zimanên wan jî bi navê komzimanên "Sansekritî" dihatin naskirin .

Hinek dîrokzan û karnasên zimanên kevin dibêjin , navlêkirina "Hîndo-Ewropî" jî vî têgeha ku pê hatiye nasîn firehtir e. Anku, hemû zimanên ku jî koka Arî hatine der, ji Hîndîstanê ta Amerîka hemû dikevin bin sîwana navê "Hîndo-Ewropî", wek koma zimanên Sansekritî , Êranî , latînî , Girmanî , Silavî , Girêkî (Yûnanî) û hinên ditir...

Li vî gorê em dibêjin , zimanê Kurdî yek ji komzimanên Hîndo-Ewropî , malbata zimanên Êranî ye. Lê ev ziman bi taybetmendiyên xwe yê resen zimanekî serbixwe ye. Raşt e hin têkiliyên zimanê Kurdî (ji hêla hin bêje û derbirînên hevbeş ve) bi hinek zimanên ditir ve (çi kevin , çi nû) hene, lê ev jî nayê wê wateyê ku zimanê Kurdî şewezarekî zimanekî ditir e . Ew têkilî di hin zimanên dêrîn

, wek Somerî , Aviştayî û Pehlewî de diyar dibe .

Zimanê Somerî Di zimanê Somerî de hinek gotin û derbirîn bi heman deng û wate di zimanê Kurdî de jî bi kar tên. Vê diyardeya zimanî bala hin rewşên birên Kurd rakişand wê baweriyê ku girêdanê dîrokî di navbera zimanê Kurdî û yê Somerî de heye. Ev jî tê wê wateyê ku têkiliyêke regezî wan her du gelan bi hev ve girêdide, anku Somerî pêşiyên Kurdan in. Bo tekezkirina vî baweriyê wan rewşên biran deşt bi lêgerîn û lêkolînan kir, niyazên dilên xwe di belav û rojnameyan de eşkere kirin.

Di salên heştîyan de hinek nivîserên Kurdên başûr ew baweriyên xwe der barê têkilîyên Kurd û Somerîyan de li ser rûpelên rojnameyên Erebî û Kurdî weşandin. Hin nivîserên Ereb ew nêrina



Deham Ebdulfetah

nivîserên Kurd pesend nekir û bi tûndî raberî wan rawestîyan. Gengeşeyeke nivîskî di nav her du alîyan de germ bû. Her aliyekî li Somerîyan dinêrin wekî ku pêşiyên wan bin . Di sala "2000"ê serokê Îraqê ferman da dîrokzanên welatê xwe ku di konfiransêkî zanîştî de raştiya koka Somerîyan diyar bikin.

Di encamê de hemû beşdar gihiştin wê biryarê ku tu girêdan û têkilî di navbera Somerî û Ereban de nîne.

Helbestine Bijartî.. Ebûdê Mixso



KEÇA HEMDEM

Tu helbest î
Gula meşt î
Hemû heşt î
Dixemline
Zor ciwan e
Dil û can e
Canfida ne
Vîn û jîn e
Çi dilsoz e
Xwedî doz e
Rind û goz e
Heşt û tîn e
Bêhna xweş e
Hem çavreş e
Dêm çî geş e
Misk û bîn e
Ava zelal
Gewr û delal
Maka li mal
Tev evîn e
Xebatkare
Dij neyar e
Pêt û ar e
Sosinî ne
Parxwana dil
Çavên bikil
Mil dane mil
Mêşinî ne
Pirs kirî
Sax û mirî
Min tu birî
Tu dibîne
Mirin çî bî
Mijûl dibî
Bi liblib î
Kerb û kîn e
Bi nîşan î
Perîxan î
Çi şervan î
Bi mizgîn e
Te daye soz
Xweş kirî doz
Kom kirî koz
Ronahî ne
Şoreş çû ye
Mebê zû ye
Gel li dû ye
Hiş û vîn e
Xwedawend î
Gula rind î
Serbilind î
Pêşengî ne
Wek te nedî
Hêz û xwedî
Ta sermedî
Zerzengîn e
Jan û keder
Tev daye der
De her û her
Jin û jîn e
Keça hemdem
Evîna Mem
Xuşka Rîstem
Parastî ne
Aravêj e
Ji tîrêj e
Bêje bêje
Serkeftî ne
Serkeftî ne

ZEMÎN

Hey zemîn
De bêje bêje
Kî ji te re yar e
Kî ye neyar
Tirs min jî sibê
Siba bêbext û dijwar
Li ser keda salan
Bikim qêrîn
Bikim hawar
Kes bi hawara min ve neyê
Ker û kor bibin
Wek her car
Bibim belengaz û jar
Jaaaar ...jar û jar
Hey zemîn
De bêje
Min me-guvêşe, nebirêje
Raştiya hawara min
Mizgînê dide buhar
Bes dilê min bike
Pêt û ar
Sibeh wê bê
Cuda bibî ji hev
Paqijî û gemar
Her tişt wê bibe diyar
Bes li min giran bike bar
Bes li min giran bike bar


Efrîn

Efrîn
Efrîna min
Ez ê tîp bi tîp
Navê te
Li ser rehên dilê xwe
Çap bikim û binivîsim
Bi xwîna rehê
Dar û daristanên te
Şîn bikim, bişkivînim
Pelo pelo bicivînim
Û bikelînim
Dermanê azadiyê jê derînim
Gemara ser parzûnkê dayikê
Li ser rûyên
Xinîzê li Enqerê
Bibim û binim
Bi xeyalên Arînan
Ser çiyayên Lêlûnê
Bi jîna biratiya gelan
Bi vîna dayikên şehîdan
Latan bi kevir kim
Yekoooo yeko
Li kedxwaran
Bibarînim û bibarînim
Efrîn
Efrîna min
Ji kaniyên Meydankê
Ji keleşan
Ji çanda Hûrî
Ji bêhna zeytûnan
Soza paraştinê bi cî binim
Xeman mexwe Efrîn
Efrîna min
Di parxona dil de
Te dipêçim
Tev ar û tîn im
Kî ye ew
Te ji pêçeka dayika min
Ji hêlîna rûmetê

Bi awazên Raco û Bilbilê
Bi dilana şoreşê
Bi nêçîra roviyan
Te bixemlînim û bixemlînim
Efrîna min

HİLÊLIYÊ

Tu bû kaşê eş û jan
Hilêliya dil û can
Şaxek ji van şaxan e
Zanyarî û dîrokvan
Xwîn pijiqand ezman e
Li Qamişlo bû nîşan
Ber bi jor de hildane
Şan û rûmeta Kurdan
Ji qadê û ji yadê
Ji singê mijtin raman
Ramanek welatî ye
Çi dawet e xweş dilan
Dilana şoreşê ye
Bi xwîna hate avdan
Ava Dicî û Ferat
Hênîk nake van dilan
Dilê birîn û şewat
Dike doza tolhildan
Nasnameya kurdi ye
Çelenga vîn û viyan
Tev bir û bawerî ye



Egîd in tev qehreman
Li jêr û jor te kaş in
Konê rûmetê vedan
Tîrêjan belav dikî
Ronahî û neqşedan
Keç û xortên te hatin
Bi dilsozî û sozdan
Bi hawar û bi qêrîn
Deng gihandine ezman
Ezmanê sermedî ye
Hêviya bav û kalan
Bingehêk rûmetê ye
Mîna Cemşîd û Ciwan
Mîstefa, Îsa, Elî
Bîranîn û dibîstan
Li jêr û jor te kaş in
Her milekî goriştan
Şînahî û hêvî ye
Şîn dîke jîn û jîyan
Bêhna Şêxo jê dikim
Bi awazên Kurdistan
Yan şehîdên Newrozê
Ji Kurdan re serhildan
Nişana gelê min e
Lehengî û qehreman
Şaxek ji dara jîne
Jîna te ye berxwedan
Jan û êşa te ev in
Hilêliya dil û can

BINIVÎSÎNE DÎROK

Rûpelên xwe ji min re veke
Va ez hatim
Bi kêferat im

Dil bi kul û birîn im
Li ser belengaziya te
Bi hezar salan
Tu melûl ma
Bê mirad
Bê eşq û evîn
Wek kalekî riziwayî
Derî bi derî
Li parsa jiyanê digere
Ka qûtê te?!
Şerm bike, şerm e dîrok
Xwe bihejîne û vecîniqîne
Bikene rûgeş bibe
Va têkoşerên te hatin
Va Arînan te hatin
Rûpelên spî diyar bike
Bila bi tîpên zêrîn
Ji lehengiya Rîsteman
Te dorpêç bikin
Bixemlînim navên te
De binivîsîne
Dîroka rûpel bi qirêj
Ji min bitirse
Agir im agir
Ev roj roja min e
Ev dem dema min e
Şelêqa çavên xwe paqijke
Û bimeyzîne

Nivîskar Ebûdê Mixso, sala 1966'an li Amûda
Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê, paşê li bajarê
Qamişloyê bi cih bû.

Di xwendina xwe de, Peymangeha Amadekirina Ma-
mosteyan qedandiye.

Ji sala 1982'yan ve bi kurdî dinivîse. Du berhevokên
wî yên helbestan bi navên:

“Kulîlkên Zozanan” û “Vîn û Viyan” hatine çapki-
rin û du berhevokên wî yên din jî hêj destnivîs in.

Aniha Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma
Cizîrê ye.

Nameya te ya germ
Min dikelîne dikelîne
Diricifîne
Li min.... li min
Çarê ji pirsgerêka min re
bibîne
Bar giran û peya
Bi hêz û ramanên pakrewa-
nan

Ji evîna çavên evîndaran
Ji kalên xwe spartin latan
Hêviya zarokên belengaz
Şitlek biçûk
Sîk da cîhanê
Ji agirê dilê Fîsê
Bi ramanek hemdemî
Sîsika mirovan
Xakê diqelêşe
Geh çilmisî
Geh vebû
Dilopên sor çend gîşin kirin
Bûn nîşana dîrokê
Dengê ewran
Hem tav û birûsk
Bahozêke dijwar
Tisonamî
Erdhejek bi volkan
Têlên badayî û zingar
Sînor dîber xwe re birin
Ji çavên welatê min
Zingezinga mizgînê
Li guhê min dixişt
Ji dengê Heqî û Xelîlan
Ji banga Kemal û Delîlan
Lîsk û pîlan ji hev ketin
Bi xwe ketin
Tîrêjên şeveqê
Ronî dan û belav bûn
Evîn gihandin gerdûn
Ol û netew
Bi hev şa bûn
Sîsika şitlê
Bû hebûn
Bi vîn û evîna mirovan
Bi hemî reng û neqşan
Bi xwîna sor
Ji her alî
Gul vebûn
Bilind, bilind bûn
Mezin, mezin bûn

PÛŞ

Piçik piçik min pûş lê kir
Koma mezin piştî çekir
Baran barî pûş riziya
Patoza dijmin hûr nekir
Ode çekir û li ser kir
Ez di bin de dilopan kir
Beşt û mircaq xwe dane ser
Xweş, xweş miradê min nekir
Lê da birûsk dîwar hejya
Xanî ket ji mer bû çiya
Gelê bi rûmet dibêje
Ev sitara me sêwiya

Ez û sitar li gel hev man
Ser bîranînê Mîdiya
Çiya dost û hevalê min
Bi dostî ketim ser rêya
Rêya min e doza şehîd
Bi dilsozî şîn bû giya

Bumba cîhanî me
Keça kurd im kurdistani me
De binivîsîne dîrok
Binivîsîne.....binivîsîne

LAT Û MIRIN

Hey mirin...
Xwe neyne xewna min...
Ez li te digirim
Lê bi mêranî...
Tu û jîyan!
Bi hev re heval
Ji bîr meke kevirê ber serê
min
Lat û hîmê min...rewşa min
Evîne distra li nav bexçeyê te
Bexçeyê rengareng
Bê fêkî û dan
Hey lat...!
Hêza mindîroka min
Tu û dem
Bi kêferat
Koçber dibin
Tenê
Mirina bi lehengî
Mirina bê mirin
Bîranîna min

VEJÎN

Ji dilê welatê min
Çavkaniyek şelû
Bi pelqê pelq û kelandin
Avek zelal xwe rû da
Ji tîna agirê dilê dayikê

Îro ez dilê te me
Jiyana te bi min e
Jiyana rûmetê
Ma heta kengî
Tê bi kirasê rizyayî bimîne
De bes e bes
Bûkên kiras spî
Rûmetê diyarî te dikin
Li deriyê te dixin
Dihejînin dişkînin
Mebêje tu kî ye
Arîn im ez Arîn im
Nişana min Kobanê ye Ko-
ban
Çavên cîhanê
Bi hêza xwe paqij dikim
Ramanê li ser xwe dişopînim
Mejiyan diqetînim diçirînim
Welat bi welat digêrinim
Mîlet bi mîlet
Bi jîna Kurd dihesînim
Ez Arîn im
Ji ar im
Arî me
De binivîsîne dîrok
Binivîsîne
Deriyê dilê xwe veke
Heyva nav stêrkan bibîne
Bejna zirav û bedew
Bi cilên bav û kalan
Xaka te dihejîne
Çira şeva tarî
Hisreta dilan
Gula nav kevir û latan

Kultûrname

FOLKLOR (1)



Zeynulabidin Zinar

Peyvika "folklor" di nava xelkê de, ji van tiştan re tê gotin:

Li welatekî, di nava gelekî/neteweyekî de, yan jî li herêmekê, ew çalakiyên taybet ên ku xasê bi wê/wan ve ku bi nêvekarî têne bikaranîn, bi piranî jî di nava wan de ji tiştên mîna çîrok, meselok, stîran, leyztik, dîroka devkî, evsane, serpehatî, destan, henek û laqirdî, gotinên pêşyan, tore u hwd. Re tê gotin.

Lê belê peyvika "folklor" bi vî hawayê li jorê ku di nava xelkê de, tenê ji van tiştan re tê gotin, ne rast e. Lewra folklor bi wateya xwe ya ferhengî, ji hemû tiştên ku têkiliya xelkê bi wan tiştan re heye re tê gotin.

Peyvika "folk" wateya xwe bi kurdî ango gel/xelk, peyvika "lor" jî bi wateya "zanîn/zanişt". Îcar dema ev herdu peyvik gihane hev, wateya "zaniştîya gel" dide û di kurdî/kurmançî de jî "gelêrî" tê gotin.

Peyvika "folklor" cara pêşî li Londrayê sal 1846, ji aliyê William Thomasî (1803-1885) ve di kovara "Athenaeum"ê de hatiye bikaranîn. Vî camêrî wek "Folk-lore" bi kar aniye. Piştî jî Elmaniyan peyvika "folklore"yê bi kar aniye. Hin bi hin ev peyv li dinyayê (xasma jî li nava neteweyên ku zimanê wan Hinoewrûpî ye) belav bûye heta ku ketiye nêv zimanê kurdî jî.

Folklorê Kurdî pir dewlemend e. Lê li nava Kurdan pir kêman kes hene ku xebata wan li ser Folklorê Kurdî çêbûye. Li Swêdê Zeynelabidin Zinar 1.710 perçeyên folklorî berhev kirine û di deh cildên XWENÇEYê de dane weşandin. Li Yekîtîya Sovyetan jî, piraniya zaruyên malbata Celîl (Prf. Ordîxanê Celîl, Prf. Celîlê Celîl, Celîla Celîl) her yekê çend berhemên folklorî amade kirine.



Helbestvan Ehmed Bavê Biyan (Dilxwaz) îsal berhemeke nû der anî.

Ev berhem jî Dîwana Helbestan ya bi navê (Sed Helebçe û ne Kurdistan e)

Naveroka vê dîwanê behsa Êrîşa Kîmyawî ya sala 1988'an a Rêjîma Sedam Husên e ser bajarê Helebçeya Başûrê Kurdistanê.

Di wê Komkujiyê de nêzî 5000 hezar kurd ku di nava wan jin û zarok hebûn bibûn qurbanî.

Helbestvan Ehmed Bavê Biyan di heman dîwanê de bal dikşîne ser Doza Gelê Kurd û Kurdistanê û di çend Beytan de wiha dibêje:

**Dozê dozê , xweş dozê
Gulşena li Newrozê
Kengî Bighim wê rojê
Kurd Faşîstan bisojê
Zilm û Zinat nû hilê
Geş bibê rengê gulê
Kurdîstan bixemile
û dilê min her tim bibêje Dozê
dozê xweş dozê**

Kurdî Xweş e			
Çarçove:	أطار- محور	Rawestgeh:	محطة
Pêgeh:	قواعد	Wesayet:	مركبة
Matematik:	رياضيات	Gemî:	سفينة
Berevanî:	دفاع	Balafir:	طائرة
Derya:	بحر	Alternatîf:	بدیل

Gotinên Pêşyan	
- Ap biraziya, xal xwarziya ra dîke.	- Em çûn mala fatê fatê çû civatê
- Cihê pakî hebe, xerabî çîye.	- Betalî xirabiya malî.
- Barê ketiyan kes ranake.	- Bide xwe bîr, bêje wek jîr
- Çem ji kaniyan çêdibe.	- Ji derve meleye ji dil ve fileye

Xaçpîrs									
	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2									
3									
4									
5									
6									
7									
8									
9									

- | | |
|--|--|
| <p>Sîtûnî</p> <ol style="list-style-type: none"> 1-Keşte ,(Sefîne) 2- Hemwateya Hebûn û bi raweya Pirsyariyê 3-Danseke navdar ya Emerîkî ye û Qertafên kesê ku dike lê zêde bike 4- Gotina Stayîl belavkirî . 5-tiştêkî dibîne - Li gundan têne dîtîn û hinek wekî Mezarên bikar tînin. 6- Tiştê ji Kesekî birîndar re lazîm e?, Karta Pêwendiyên (Vajî-) 7- Diyarkirina helwesta di mijarekê de (Vajî) 8-Navekî Jinan , nefreta ji tiştêkî û di gel asayîş yan dezgehên emnî de nerazîbûna xwe nîşan dide 9- Du tîpên wekî hev , danûstandina bi kesekî ne hazîr re (Vajî) | <p>ASOYÎ</p> <ol style="list-style-type: none"> 1-Rêveber-Mûdir 2-Tîpeke lê bi hemû Tîpên kurdî ji bilî A re tê bikar anîn, Bi wateya (Têgihîştin) 3- Tîpeke ji navê (Mecîd) – Tîpên Gotina (Par tenê) belav kirî 4- Liştikvanekî Tîma Belçîka ye û bi eslê xwe Erebe di Lîgeya 2018'an de beşdar bibû (Vajî- Ters binivîse) 5-Bajarekî Geştîyarî yê Îtalyayê ye 6- Navê Ajalekî Giyayî, Tîpeke ji gotina Gaz tevli Tîpa (E) ya dengî 7- Sembola her welatekî cihani (Vajî),Kurte navê Kompanyeke Motrosiklêtan,Qertafa ku li Cînavka Kesane Ez tê zêde kirin. 8-Tîpa ku di zimanê kurdî de dibe navbênkar û 2 tîpên dengêr ji hev du vediqetîne, 2 tîpên dengêr, Gotina (Na) bi Erebi 9- Helbestvanekî kurd bi eslê xwe ji Bakurê Kurdistanê..... |
|--|--|

Kovara Dilop Ya 5'emîn Derket



Kovara Dilop bi hejmarê xwe ya 5'an li pêşberî xwendevanên xwe ye. Kovarê di hejmarê xwe ya sermawez-berfanbarê de "Piştî pêvajoya aştiyê ji nû ve fikirîna meseleya kurd" derxistiye pêş. Lêkolîner Cuma Çiçek di vê derbarê de pirtûkek amade kiribû û pirtûkê ji Weşanên Pirtûkan a Amedê de ji di panelek de ev mijar girtibû dest. Ev mijara ku rojevîbûna xwe diparêze kovarê ji wê panelê beşek mezin girtiye û pêşkêş kiriye.

Di hejmarê berî ve de li ser weşangeriya kurdî nîqaşek hatibû sazîkirin, di vê hejmarê de Dawud Rêbiwar bi sernavê "Weşangeriya Kurdî: Pirsgerêk pir bin jî geşedan berdeham e" nivîsek nivîsiye û hem dosya-

ya berî ve temam kiriye, hem jî rexneyên xwe li axaftinên di wê dosyayê de kirine. Rêbiwar wisa dibêje: "Weşangerên kurdî tim di hevpeyvîn û nîqaşên xwe de balê dikişînin ser nebûna şirketeke belavkariya pirtûkên kurdî. Rast e, lê belavkar wê li kê belav bike? Di baweriya min de, eger daxwazê baş hebe ji bo pirtûka bi kurdî, şirketeke belavkariyê ya kurdan nebe jî dê şirketên belavkariyê yê li Tirkiyeyê ve valahiye dagirin û wê berhemên kurdî belav bikin."

Ji nivîsan nivîsa Dr Erdal Sîpan jî derketiye pêş. Sîpan bi navê "Di tendurîstiyê de feraseta bindestiyê" girtiye dest. Nihat Gultekîn jî li ser Cemîla Celîl ku wê jiyana xwe li ser xebata muzîka kurdî borandiye gota-

rek weşandiye. Di van demên dawî de Amed Spor di rojevê de ye û gelek kes rexne dikin. Ji nivîsên tirkî Mehmet Ozyazanlar bi sernavê "Vurun Amedspor'a" (Li Amed Sporê xin) nivîsa xwe rêstiye.

Muslum Uzulmez, Recep Dildar, Dûrcan Cîrano, Îbrahîm Karaca, Nevzat Onaran, Bülent Gedîk, Fatîme Tikîn, Namîk Kemal Dînc, Erdal Sîpan, Mehmet Çakmak, Mehmet Bayrak, Metin Yamalat, Cemil Oğuz, Enver Ozkahraman, İsmail Dîndar, Barîş Avşar, Ferîd Demîrel bi nivîsên xwe, her wiha Furûx Feroxзад, Muslum Aslan, M. Çiya Mazî, Çorê Arda, Gulden Hayaloglu Kaya, Osman Sebrî jî bi helbestên xwe di kovarê de cih girtine.

Peyva Windayî

Ji bo tu peyva windayî nas bikî,peyvên li jêrê xêz bike.

AMBARGO,BÎNGOL,HERÊM,TAVIL,LEM,BÎRANÎN,ÇAL,GULE, SAXLEM,PROJE,SEWAL,PÊVAJO,SIRÛD,CÊRÎ,HENASE

Peyva Windayî ji 4 Tîpan pêk tê,ew jî hemwateya peyva (HEL) e.

S	A	X	L	E	M	G	U	L	E
T	A	V	I	L	P	R	O	J	E
B	Î	R	A	N	Î	N	Ç	A	L
P	Ê	V	J	O	H	E	R	Ê	M
A	M	B	A	R	G	O	L	E	M
Ç	A	R	E	B	Î	N	G	O	L
C	Ê	R	Î	H	E	N	A	S	E
S	I	R	Û	D	S	E	W	A	L

Bersiva Xaçpîrsa Hejmarê Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	F	I	R	O	K	X	A	N	E
2	E		I	R		U	L	Û	M
3	Y	A	Z	D	E	H			
4	D		G	E	R	D	E	N	Î
5	E		A	K	T	A	R		M
6		A	R		O	N	B	I	R
7	A	R		A	Ş		Î	R	O
8	V	A	N		Î	M	L	A	
9	Î	M	A	N		F	E	Q	Î